

**DEPARTEMENT  
GESUNDHEIT UND SOZIALES**

Kantonaler Sozialdienst

Unterabteilung Asyl, Sektion Betreuung

12ê Adara 2020

**ZANYARÎ Û DESTÛRKARÊN NÛ**

**Vîrûsa Koronayê – KOVÎD-19**

---

**1. Hin zanyarî li ser rewşa niha**

Hejmara tûşbûyiyên bi KOVÎD-19'ê li welatê Swîsreyê bilez zêde dibe. Li gorî ragihandina nû, 858 babetên erênî hatine naskirin ku çar kes ji wan li Mîrnişîna Lîxtên Ştaynê (Liechtenstein) ne. Heta niha li Swîsreyê çar kesan ji ber tûşbûna bi KOVÎD-19'ê canê xwe ji dest dane.

Vîrûsa Koronaya Nû bi vî awayî tê veguhestin:

- **Bi rêya têkilliya nêzik û dirêj** Dema ku kesek zêdetir ji 15 deqîqeyan û di navbira kêmtir ji du metreyan digel kesek tûşbûyî da be.
- **Bi rêya Hûredilopan** Ji ber pişkîn (Bênjîn) an kuxîna kesê/a tûşbûyî, vîrûs dikarin li ser şilava difil, dev an çavê kesekî saxlem rûnin.
- **Bi rêya destan** Hûredilopên Kuxîn û Pişkînê dikarin xwe li ser çermê destan bizeliqînin. Dema ku kesê saxlem, destê kesê tûşbûyî bi vîrûsê dipelîne, ev ihtimal heye ku vîrûs bigihêje dev, difin an çavê wî kesî.

Nexweşiya çêbûyî bi rêya Vîrûsa Koronayê dikare bi pêvajoyên gellek ciyawaz be. Di hin kesan da nîşaneyên nexweşiyê gellek lawaz in û ewna bi dijwarî bi nexweşiya xwe dihesin. Hinekên din jî dê hewcetî bi dermankirina tam li nexweşxaneyê hebin.

Berçavgirtina paqijîya kesane û danîna navbirê digel kesên din pêwîst e: Jibo parastina xwe û girîngtir ji wê, parastina kesên ku li ber xeterê ne. Kesên li ber xeterê divê heta ku ji destê wan tê bi awayekî ciddî navbireke pêwîst digel xwe û kesên din daynin.

**Kesên li ber xeterê û pêvajoya nexweşiyê**

Kesên ku bi awayekî taybet li ber xetera nexweşiya giran in, kesên ji 65 salî zêdetir û kesên ku nexweşiyê berdewam a jipêşve bi wan ra heye:

- Zexta zêde ya xwînê
- Nexweşiya Şekirê (Diyabêt)
- Nexweşiyên dil û demaran
- Nexweşiyên dûdar ên bêhnkişandinê
- Nexweşî û dermanên ku Pergala Ewlehî ya Leşî lawaz dikin
- Şêrpence (Kanser)

## 2. Berpirsiyariya kesane û Palpiştî

Hemî kesên ku Vîrûsa Koronayê bi wan ra heye, nîşaneyên nexweşiyê bi wan ra tune û hesta nexweşiyê nakin. Jibo ku ev vîrûs bê-berbend berbelav nebe, hewcetî bi berpirsiyariya kesane heye.

### Ev tişt girîng, pêkhatî ji berçavgirtina destûrên paqijî û xwe-parastinê ji aliyê hemiyar va ye.

-> Şûştina durust a destan, pişkîn û kuxîn li nav destmala kaxezî an li nav bask û enîşka xwe, mayîna li malê di dema ta û kuxînê da, berçavgirtina navbira xwe û kesên din, dest-nedan, seredana bo Ofîsa Bijîşk an beşa Acîl -tenê- piştî têkilliya telefonî.

### Jibo cihê mayîna me jî berçavgirtina van babetan pêwîst e:

- Devberdan ji pejirandina Mêvanan û çûyîna bo mêvaniyê
- Devderdan ji kombûn/mêvanî/cejn û hwd.
- Berçavgirtina paqijiyê kesane
- Piştgirî ji sergêriyê di dema paqijkirinê da
- Berçavgirtina destûrkarên sergêriyê
- Palpiştîya dualî

## 3. Kiryarên dema tûşbûna bi nexweşiyê

Heke nîşaneyên biçûk ên weke Ta û Kuxînê li te xuya bûne, nabe ku digel bijîşk bikevî têkilliyê an seredana dixtor bikî. Hebûna van nîşaneyan xwe-bixwe nîşana tûşbûna bi Nexweşiya Koronayê nîne. Heke ev nîşane xuya bûn, bi kesekî ra ku dikare baldariya te bike, bikeve têkilliyê. Li odeya xwe bimîne û dev ji çûyîna bo dibistan/polên din/cihê kar berde. Tîma sergêriyê hevrê digel Tîma Bijîşkiyê dê destûrkarên din tayîn bike. Tîma Sergêriyê li gorî rewşê, dê yek ji van kiryanan jibo te pêk bîne:

### Îzolekirina li malê

- Heke nîşaneyên weke Kuxîn û /an Tayê bi te ra hene, tu yê li malê bimînî û heta radeya pêkan digel kesên din nekevî têkilliyê. Tu yê li malê jî Maskeyê daynî ser dev û difina xwe.
- Piştî dakêşana nîşaneyan, tu yê 24 saetên din jî li malê bimînî.

### Qerentîneya (Quarantäne) Navmalî

- Têkilliya te bi kesekî ra hebûye ku testa Koronaya Nû ya wî Erênî derketiye. Di vê rewşê da heta 5 rojan, ji roja piştrastkirina nexweşiya wî kesî, tu yê li mala xwe/li odeyê bimînî, heta heke hîç nîşaneyê nexweşiyê di te da tunebe. Tu yê li malê jî Maskeyê daynî ser dev û difina xwe.
- **Di vê heyamê da bi hîç kesekî ra nekeve têkilliya ji nêzik va.**

Heke tu ji kesên li ber xeterê yî an nîşaneyên nexweşiyê yên te her ku diçin girantir dibin (Taya zêde, Bêhnkişandina dijwar): **Vê mijarê ji sergêriyê ra raqihîne.**

Tenê dema ku rewşa te berdewam xerabtir dibe û sergêr an bijîşk li ber dest nînin, tu bixwe seredana beşa Acîl a nexweşxaneyê bike. **Dema qewimîna vê babetê divê ji pêş va digel beşa Acîl bikevî têkilliyê.**